Religion: Ressource Risiko

Friedrich-Alexander-Universität
Philosophische Fakultät und
Fachbereich Theologie

**Prof. Dr. Manfred L. Pirner**
Serokê Perwerdehiya dînî û şêwaza
fêrkirina perwerdehiyên dînî yên protestan

manfred.pirner@fau.de
https://www.evrel.phil.fau.de

Universität Siegen

**Prof. Dr. Ulrich Riegel**
Zanîngeha Seigenê Zankoya I
Semînara Teolojiya Katîlok

ulrich.riegel@uni-siegen.de
https://www.uni-siegen.de/phil/kaththeo

Universität Erlangen-Nürnberg • LS für Religionspädagogik •
Regensburger Str. 160 • 90478 Nürnberg

Nürnberg/Siegen, Nîsana 2022an

**Rapirsîn derbarê girîngiya dîn di rûbirûbûna di gel jiyanê ji bo penaberan.**
**20 Euro wek xelat ji bo sipasî bo beşdarbûnê!**

Birêz / Rêzdar,

ev name **bo wan xortan e ku ji welatê xwe reviyane û li dû wergirtina piştgiriyê li Almanyayê ne**. Eger ev yek derbarê te rast nîne, vêca pêwîst nake bala xwe bidî ser vê nameyê. Di vê rewşê da tu dikarî wê bidî ber destê dostên ku ji Sûriye, Iraq an Efxanistanê reviyane û temenê wan ji 16 heta 24an e.

Em dixwazin pê bizanin ku rewşa xortên bi serpêhatiya revînê çawa ye da ku derfeta piştevaniya baştir ji wan were dabînkirin. Em dixwazin tê bigihêjin ku rola dîn (ol) di jiyana wan da çawa ye. Ji ber vê yekê, em **rapirsîneke** bi cih tînin. Em ji te dixwazin ku beşdarî rapirsînê bibî.

Em lêkolerên zanîngehên Erlangen-Nürnberg û Siegenê ne. **Em girêdayî bi dewletê û rêveberiyên welatiyên derveyî nînin**. Bersivên we jî nakevin ber destê rêveberiyan. Di dema nirxandina rapirsînê da tu navek an cihê rapirsînê nayê girtin. **Loma tu wek nenas dimînî**. Eva ku gelo tu beşdarî Bernameya Lêkolînê dibî an na, tu bandorekê li ser daxwaza teya penabertiyê an jî rewşa te ya mayînê nake. Beşdariya di rapirsînê da **tam dilxwazî** ye. Rapirsîna me û pêvajokirina daneyên komkirî bi vê rêyê li gorî destûrkarên parastina daneyan ên Ewropayê ne û ji aliyê memûrên parastina daneyan ên her du zanîngehên me va hatiye piştrastkirin. Yanî tu kesek nikare piştra bibîne ka te çi bersivek daye. Daxuyaniya parastina daneyan a bi şiroveyên zêdetir li nav nameyê heye. Di destpêkê da - rêzik vê yekê dibêjin – li ser komputer an mobayla xwe razîbûna xwe ragihînî.

**Pirsnameya** ku em ji te dixwazin wê dagirî, bi zimanên erebî, farisî, kurdiya kurmancî, inglîzî û almanî liberdest e. Tu dikarî bi xwe bibijêrî ku dixwazî bi çi zimanekî di gel me bikevî têkiliyê û pirsnameyê jî bi zimanê ku dibijêrî, dagirî.

ji kerema xwe bizivirîne

Funded by DFG Deutsche Forschungsgemeinschaft German Research Foundation

Religion: Ressource Risiko

Ji bo ku bikarî prespektîveke deqîqtir ji pirsnameyê bisêwirînî, em di dewamê da çend pirsan ji te dipirsin:

Tu aniha çiqasî ji jiyana xwe razî yî?

Dînê (ola) te / Baweriyên te yên mezhebî çiqasî bo te girîng in?

Têgihîştina te bi çi awayî ye, gelo penaber li vir li cihê xwe têra xwe alîkariyê werdigirin?

Gelo tu bi xwe têra xwe alîkariyê werdigirî?

Em ê gelekî kêfxweş bibin eger beşdarî rapirsîna me bibî û ji bo têgihîştina baştir a jiyana penaberan, yarmetiya me bikî! Em ji bo vî karî bi **koponeke-Kirînê** ya bi bihayê **20 Euro** sipasiya te dikin.

Eger tu dixwazî ku beşdarî rapirsînê bibî, ji kerema xwe bi rêya bijardeyeke ragihandî li jêrê bi me ra bikeve têkiliyê. **Di wêrewşê da yek ji cihênerên hevpeyîvînê dê bi te ra bikeve têkiliyê û civînekê di gel te saz bike.** Tu dikarî bibijêrî ku ev civîn li mala te, li kafeyekê an li ba me li zanîngehê pêk were. Piştra cihênerê hevpeyîvînê dê alîkariya te ji bo dagirtina pirsnameyê li komputer an mobaylê bike.

Ji bo beşdariyê ev bijarde li ber destê te ne:

Ji bo navnivîsandinê:

**Bijardeya 1:** Kodeya QR'yê ya kêlekê sken bike an ji kerema xwe serdana vê lînkê bike: www.rereri.phil.fau.de/join. Piştî wê, tu yê bo malpera me werî rêkirin ku tê da vîdyoek û zanyariyên zêdetir dikarî bibînî. Li wir tu dikarî bi rêya forma bersivê, vegeriyana xwe ragihînî.

**Bijardeya 2:** Ji kerema xwe E-mailekê pêkhatî ji nav û hejmara xwe ya telefonê bo me bişîne (projekt-rereri@fau.de) û ragihîne ku vedibijêrî bi çi zimanekî bersiva pirsên di pirsnameyê da bidî. Ji kerema xwe, ji bilî vêya ji me ra binivîse ku gelo zimanekî duyem heye ku tu bikarî bi wî jî bersiva pirsên pirsnameyê bidî.

Eger hîn pirsên te mane, tu dikarî wan jî bişînî bo adresa Emaila projekt-rereri@fau.de.

Di gel rêz û silavan,

Prof Dr. Manfred Pirner		Prof Dr. Ulrich Riegel